



Vaksîna xurtkirinê bi vaksînê mRNA (Pfizer/BioNTech, Moderna)

Vaksînên mRNA gelekî baş hemberî nexweşiya kovîd-19 ya razana li nexweşxaneyê diparêze. Anegorî temen û cureyê, parastina ku ji hêla derzîledanê ve tê kirin dikare bi demê re kêmtir bibê. Parastina ji nexweşiyên sivik û veguhestina vayrusê bi demê re ji bo her kesî kêmtir dibe. Ev dikare anegorî cureyê pir an kêmtir zû çêbibe. Ji ber vê sedemê em bo kesên 12 salî mezintir ji her kesî re tewsiye dikin ku derziya xurtkirinê lêdin.

Mebest ji vaksîna xurtkirinê çi ye?

Vaksîna xurtkirinê pergala ewlebûnê ya patojenê tîne bîra mirov. Ev dê parastina zêde ya bi lêdana derziyê vegeherîne rewşa berê û dirêj bike.

Vaksîna xurtkirinê li kê tewsiye dibe?

Ji bo her kesê 12 salî û mezintir derziya xurtkirinê tê tewsiyekirin.

• Kesên 65 salî û mezintir

Ji bo van kesan, derziya xurtkirinê di serî de tê tewsiyekirin ku baştirîn parastina gengaz hemberî KOVÎD-19-a giran hebe ya ku pêdiviya razana li nexweşxaneyê heye. Ew bi taybetî tewsiye dibe bo:

- Kesên 75 salî û jortir;
- Kesên 65 salî û jortir bi nexweşiyên demdirêj bi metirsiya¹ herî zêde ya nexweşiya Kovîd-19;
- Kesên niştecih û yên tîne malên perestariyê, malên muqateya niştecihbûnê, û cihên muqateya rojane bo kesên extiyar.

• Kesên ji 16 heta 64 salî

Di mirovên di bin 65 saliyê de derziya xurtkirinê parastina li dijî tûşbûnê, nexweşiya giran a sivik û pir hindik û dûhatên wê zêde dike (wek mînak bandorên demdirêj ên KOVÎD-19 û bêhêziya karkirinê). Di heman demê de ew dikare bibe alîkar ku bi demkî belavbûna vayrusê kêmtir bike. Ev tewsiye bi taybetî bi kar tê bo:

- Kesên bi taybet zîyanbar jêr 65 salî bi nexweşiyên demdirêj bi metirsiya herî zêde ya bo nexweşiya giran a Kovîd-19¹.
- Niştecih û kesên jêr 65 salî ku tîne mala perestariyê, cihên muqateya niştecihbûnê, û cihên muqateya rojane bo kesên extiyar.
- Karkerên muqateya tenduristiyê bi tîkiliya rasterast digel kesên nexweş û muqatekarên kesên li ber metirsiya taybet.

Vaksîna xurtkirinê li hemû jinên ducanî jî ji sê mehên duymê û jinên şîrê didin zarokan tewsiye dibe.

• Nûciwanên di navbera 12 û 15 salî de

Ji bo van kesan derziya xurtkirinê tê tewsiyekirin eger ew dixwazin parastina xwe ji tûşbûnê û nexweşiyên sivik zêde bikin û xetera veguhestinê li tîkiliyên nêzîk (endamên malbata xwe) kêmtir bikin.

Kingê divê vaksîna xurtkirinê were lêdan?

Derziya xurtkirinê ji 4 mehan piştî ewlebûna tam a bingehîn bi derziya mRNA tê tewsiyekirin. Ewlebûna bingehîn a tam piştî van heye:

- du doz vaksîna mRNA vaccine; yan
- tûşbûneke erêbûyî bi koronavayrusê + dozeke vaksînê ya mRNA herî kêmtir 4 hefteyan wêdetir (bêyî li dûhevûna wê).

¹ Xişteya/tabloya 2, rûpel 11 ya pêşniyara lêdana vaksîna mRNA: *Pênaseyên nexweşiyê ji bo kesên ku di xetereya herî mezin de ji ber nexweşiyên kronîk tîne çêkirin (bi Almanî)*

Ger enfeksiyona bi coronavirus re piştî vaksîlêdana mRNA ya bêkêmasî ya bingehîn hate pejirandin, qaîdeyên jêrîn tîne bicîh kirin:

- Eger tûşbûn di nava 4 mehan ji ewlebûna bingehîn de be, vaksîna xurtkirinê çarmehan piştî wê tûşbûnê tewsiye dibe.
- Eger tûşbûn ji 4 mehan zêdetir piştî qedandina kursa derzîledanê ya seretayî çêbûbe, bi gelemperî hewcedariya niha ji bo derziya xurtkirinê zêde tune.

Ji bo nûciwanên 12 heta 15 salî yên ku ji 4 mehan piştî derzîlêdana tevahî ya destpêkê de tûşbûna bûne, derziya xurtkirinê nayê tewsiyekirin. Eger tûşbûna 4 mehan pirtir piştî derzîlêdana bingehîn hebe, lêdana derziya xurtkirinê gelek caran di vê demê de pêwîst nîne.

Kîjan vaksîn û doz bo vaksîna xurtkirinê bi kar tê?

Di bingehê de, eger mimkin e, divê heman vaksîn bo vaksîna xurtkirinê wekî ewlebûna bingehîn were bikaranîn. Eger ev nebe, vaksîna din a mRNA jî dikare were bikaranîn. Eger vaksînên mRNA yên cuda bo ewlebûna bingehîn were bikaranîn, ya xurtkirinê dikare bi yek ji du vaksînan be.

Pêşniyar ew e ku derziya Pfizer/BioNTech ji bo kesên di navbera 18 û 29 salî de ji bo derziya xurtkirinê were bikaranîn.

Bo vaksîna Pfizer/BioNTech, heman dozê didin bo vaksîna xurtkirinê ya ewlebûna bingehîn. Bo vaksîna Moderna, nivê dozê bo xurtkirinê lêdidin.

Li ku dikarin vaksînê lêdin?

Kanton berpîrsên vaksînkirinê ne. Li malperê yan Xeta zanyariyan (Infoline) a kantona xwe binêrin (www.foph-coronavirus.ch/cantons) ku bizanin li ku dikarin navnivîsî bikin û vaksînê lêdin. Yan ji bijîşk, dermanfiroşê xwe yan dermanfiroşiyê bipîrsin.

Zanyariyên bermayî bo vaksîna xurtkirinê û vaksîna ewlebûna bingehînê yek in û hûn dikarin wan di vê faktnamê de bibînin «Zanyariyên giştî ser vaksînlêdana Kovîd-19 bi vaksîneke mRNA».

